



Dara Zeytûnê



Zeytûn dareka her keske. Bilndahîya wê digehîte (15) mêttran û bi sedan salan temenî dibet. Hindek darêن zeytûnê hene temenê wan gehiştîye hizar salan jî. Li sala (15)ê berî didet. Dû rengên zeytûnan hene: zeytûna kesk û zeytûna reş. Hindek di hûrin hindek di girin. Hindek ji bo xwarinê ne û hindek jî ji bo zeytê ne. Zeyta zeytûnê ji baştîrîn zeytên xwarinê ye. Salane pitir ji milyon tenêzeytûnan dihêne berhemhênan. Li cîhanê Sipanîya yekemîn welat e bi çandina zeytûnê û nêzîkî 38% ji berhemê hemî cîhanê ji wêrê dihêt. Di dîf Sipanîya ra Îtalîya, Yunan, Pûrtugal, Tonis û Tirkîya dihêن. Her wesa li Filstînê, Sûriya û Lubnanê jî zeytûn dihêne çandin.

Çinîna zeytûnan.



Zeytûna reş



Kulîlka zeytûnê ji çar
belgan pêk dihêt.



Berkê zeytûnê.



Zeytûna kesk



Li Kurdistanê dara zeytûnê heye lê bi hejmareka kêm. Zeytûn li paîzê dihêne çinîn û her dareka gehîştî ji (5) heta (50) kîloyên zeytûnan didet. Ji her (100) kîloyên zeytûnan ji (20) kîloyên zeytê çê dibin. Dara zeytûnê ji ber ku dareke hêdî werarê diket û mezin dibît, qurmê wê gelekê mukme û ji bo mobilîya gelekekê baše. Zeytûn dihêne herşîn û givaştin û bi wê rêkê zeyt jê derdikevît. Zeyta herî baş ji bo xwarinê ye û ya dî jî ji bo pişesazîyê ye wek çekirina sabûnê.



Zeytûn Sîmbola Aştiyê ye
Takekê zeytûnê di demê kutirkrkê da li hemî cîhanê nîşana aştiyê ye. Mirovê berê dema vîyaya dexweza lêborînê ji êkî biket yan jî dumahîya bi şerekî bînit takekê zeytûnê di destê xwe da digirt.